# Binpêkirinên rêxistina DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê

## Danasîna qanûnî û dadgehên taybet

### (Beşa duyem)




**Navenda Firatê ya Lêkolînan**

**Bi erebî peyda ye**

**Bi îngilîzî peyda ye**

**(Beşa yekem ji vê lêkolînê)**

## Pêşgotin

Pêwîstîya qonaxa piştî têkçûyîna rêxistina DAIŞ`ê ya leşkerî bi lêkolînkirina çawanîya danûstandina bi paşmahîya wê ya li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê re heye; ev paşmahîya ku di navbera şaneyên wê yên veşartî, jin û zarokên li kamp û navendên rehabîlîtasyonê[1], her wiha çekdarên wê yên girtî de tê dabeşandin. Van çekdaran, ku hejmara wan bi hezaran tê texmînkirin, tawanên herî hovane û tundrew li dijî gelê Sûrîyayê pêk anîn, bi taybetî li dijî kêmarên etnîkî, olî û nijadî li herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyayê. Ev binpêkirin û sûcên ku ji alîyê vê rêxistina teror ve tên kirin, dibe ku bibin sûcên li dijî mirovahîyê, sûcên şer û sûcên qirkirinê[2].

Di demekê de ku civaka navneteweyî, bi nûnertîya Encûmena Ewlekarîyê ya NY, berpirsîyarîyên xwe di parastina aştî û ewlehîya navneteweyî de bi cih nayîne, lêkolînkirina mekanîzmayên dadwerî yên pêkan ji bo dadgehkirina sûcdarên DAIŞ'ê xwedî girîngîyeke mezin e, nemaze ku civaka navdewletî ti gavên bi bandor û cidî ji bo hilweşandin û çareserkirina paşmahîya DAIŞ’ê naavêje . Ev yek bû sedem ku Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê li gorî qanûn û berpirsyarîyên xwe biryara dadgehkirina sûcdarên DAIŞ’ê li pêşberî dadgehên xwe bide.

Li nik wê yekê, mijara darizandina sûcdarên sûcên şer, sûcên der-mirovî û sûcên qirkirinê ji bo çareserîyê girîng e, lê bêyî ku ev kesên binpêkiririnên mezin kirine ji lêpirsîn û cezayê li ser sûcên navdewletî yên herî hovane bifilitin, ev jî weke rêgezeke bingehîn a qanûna navdewletî[3] .

Li alîyekî din, bicihanîna edaletê ji qurbanîyan re, û çareserkirina parçeyekî girîng a paşmahîya DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ku ew jî dosyaya girtîyên DAIŞ`ê piştî bibinketina rêxistina terorîst di Adara 2019`an de jî pirr girîng e. ev ji bilî girîngîya dîrokî ya van dadgehên

[1] Li vê vegere: Navenda Firatê ya lêkolînan, "Zarokên DAIŞ`ê li kamp û navendên rehabîlîtasyonê.. (Metirsî, kêşe, û rêyên çareserîyê)", link: https://firatn.com/kur/?p=2461

[2] Li vê vegere: Navenda Firatê ya lêkolînan, "Binpêkirinên rêxistina DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê", link: https://firatn.com/kur/?p=2494

[3] [3] إبراهيم دراجي، "الجريمة الدولية"، الموسوعة القانونية المتخصصة، https://arab-ency.com.sy/law/details/25771/3

taybet bi sûcdaran, ku bi awayekî ji awayan dê bi pêşketina qanûna tawanên navdewletî re bibe alîkar. Li gorî tişta me gotî, pirseke bingehîn xwe dide der, ew jî ev e: Dadgehên taybet bi cezakirina sûcdarên DAIŞ`ê yên girtî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê çi ne? Her wiha ev pirsên din:

- Gelo pêkan e sûcdarên DAIŞ`ê li pêşberî Dadgeha Tawanan a navdewletî bên darizandin? Çi astengî li pêşîya vekirina dozeke berpirsyarîyeke tawanan der heqê sûcdarên DAIŞ`ê li pêşberî vê dadgeha navdewletî hene?
- Gelo tawankarên DAIŞ`ê dikarin li pêş dadgeheke navdewletî ya taybet ku ji alîyê Encûmena Ewlekarîya Navdewletî ve hatibe damezrandin bên dadgehkirin, her wekî dadgeha taybet ji bo Yûgoslavyaya berê yan dadgeha taybet ji bo Ruandayê?
- Gelo endamên DAIŞ`ê dikarin li pêş dadgeheke navdewletî ya hevbeş bi hevkarîya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bêne dadgehkirin, ew jî weke beşek ji berpirsyarîya civaka navdewletî ji bo piştgirîkirina hewlên şerê li dijî terora navdewletî û jinavbirina mîrata DAIŞ`ê?
- Herî dawî, gelo pêkan e sûcdarên DAIŞ`ê li pêşberî dadgeheke hundirîn a navxwe û li gorî qanûnên Rêveberîya Xweser, li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bên darizandin, û gelo I astengî li pêşîya damezirandina dadgeheke bi vî rengî hene?

Di vê lêkolînê de, em dê hewl bidin bersiva van pirsên han li gorî rêbaza wesifî-dahurandî bidin. Em dê rê û mekanîzmeyên dadwerî yên navdewletî û xwecihî yên herî girîng ku karîbin di mijara vekolînkirina sûcên ku rêxsitina DAIŞ`ê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê kirine xwe bispêrin wan bikolin, da ku sûcdar bên dadgehkirin, her wiha hemû astengî û zehmetîyên ku li pêşîya vekirina dozeke lêpirsînê ya li dijî çekdarên DAIŞ`ê disekinin û rê nadin edalet ji qurbanîyan re heta roja îro bi cih were bên zelalkirin. Ev yek jî li gorî vê plansazîyê:

**Beşa Duyem: Dadgehên taybet bi endamên DAIŞ`ê**

**Şaxê yekem: Dadgehên navdewletî yên ku dikarin endamên DAIŞ`ê dadgeh bikin.**

**Yek: Derfeta damezirandina dadgeheke navdewletî ya taybet.**

**Du: Derfeta dadgehkirina li pêşberî Dadgeha Tawanên Navdewletî.**

**Şaxê duyem: Dadgeha xwecihî ya ku tê gotin ku dê ji bo dadgehkirina endamên DAIŞ`ê bê avakirin**

**Yek: Sedem û mehne**

**Du: Astengî û zehmetî**

## Beşa Duyem:

## Dadgehên taybet bi dadgehkirina endamên DAIŞ`ê

Binpêkirinên hovane û xeternak ên qanûna navdewletî ya mirovî, qanûna navdewletî ya mafên mirov û qanûna tawanan a navdewletî, ku ji alîyê rêxistina DAIŞ`ê ya terorîst ve li Sûrîyayê bi giştî û li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyayê bi taybetî hatine kirin, dibe ku bibin tawanên dermirovî, tawanên şer û qirkirinê. Tawanên bi vî rengî ji bo têkoşîna li dijî bêcezabûnê, bidestxistina dadmendîya navneteweyî, û piştgirîkirina hewildanên ji bo têkoşîna li dijî terora navneteweyî, û ji ber ku ew zirarê ne tenê didin civaka xwecihî, lê didin tevahî mirovahîyê jî, pêwîstî bi darizandin û cezakirinê heye.

Tevî wê jî, û tevî bangên Rêveberîya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ji NY û Encûmena Ewlekarîya Navdewletî re ku ev doza han veguherînin dadgehên navdewletî yên taybet bi cezakirina sûcdarên DAIŞ`ê li ser hemû sûc û binpêkirinên ku derheqê kêmarên olî, û netewî de li herêmê kirine, lê dîsan jî civaka navdewletî bi erka xwe ya derbarê dosyaya girtîyên DAIŞ`ê yên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê de ranebû. Her wiha welatên pêwendîdar jî ji alîyê xwe ve bi berpirsyarîyên xwe yên girêdayî wergirtina welatîyên xwe yên endamên DAIŞ`ê ranebû, vê yekê hişt ku Rêveberîya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê biryara dadgehkirina sûcdarên DAIŞ`ê li pêşberî dadgehên xwe bistîne.

Em dê derfeta dadgehkirina endamên DAIŞ`ê li pêşberî dadgehên navdewletî yên taybet bi venêrîna sûcên navdewletî vekolin (Şaxê Yekem), paş jî em dê dadgehên xwecihî yên ku tê gotin dê ji bo dadgehkirina endamên DAIŞ`ê li ser sûcên li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê kirine bên damezirandin bikolin (Şaxê Duyem).

## Şaxê Yekem:

## Dadgehên navdewletî yên ku dikarin endamên DAIŞ`ê darizînin

Di milê teorîk de, gelek rêyên yasayî û mekanîzmayên dadwerî yên navdewletî hene ku dikarin serî li wan bidin da ku dadmendî û berpirsîyarî ji binpêkirinên giran û tawanên navdewletî yên ku ji alîyê Dewleta Islamî li Iraq û Şamê (DAIŞ) ve li erdnîgarîya Sûrîyayê, bi taybet[4] herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê hatine kirin, pêk werin.. Ev rêbaz bi giranî di nav xwe de Dadgeha Tawanan a Daîmî ya Navdewletî, û dadgeheke navdewletî ya taybet (xwerû yan têkil) ku bi taybetî ji bo venêrînkirina tawanên DAIŞê û dadgehkirina endamên wê yên girtî li bakur û rojhilatê Sûrîyayê were damezrandin.

Di serî de em dê derfeta damezirandina dadgeheke navdewletî ya taybet ji alîyê Encmûna Ewlekarîya Navdewletî ve bikolin, ew jî da ku sûcên rêxistina DAIŞ`ê bên venêrînkirin û berpirs bên cezakirin (Yek), paşê jî em dê berê lêkolînê bidin derfeta dadgehkirina sûcdarên DAIŞ`ê li pêşberî Dadgeha Tawanên Navdewletî (Du).

- **Yek: Derfeta damezirandina dadgeheke navdewletî ya taybet**

Dadgehên tawanên navneteweyî yên taybet, bi derketina hiqûqa navneteweyî ya hevdem[5] ve girêdayî ne, ji ber ku "Dadgehkirinên Tokyo û Nurnberg"[6] piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn di sala 1945`an de xuya bûn ku sûcên navneteweyî yên giran, ango jenosîd, tawanên şer, û sûcên li dijî mirovahîyê dinirxînin. Piştî van her du dadgehan dadgehên taybet hatin damezrandin ku di salên 1990î de ji bo

[4] توبي كدمان، ناتاشا براك،" دليل التدريب: آليات المحاسبة عن الجرائم المرتكبة في سوريا"، https://policycommons.net/artifacts/3744867/n-ljrym-lumrtkb-fy-swry-alyt-lumhsb-dlyl-ltdryb/4550795/

[5] المحاكم الخاصة، نظرة عامة، اللجنة الدولية للصليب الأحمر، https://www.icrc.org/ara/war-and-law/international-criminal-jurisdiction/adhoc-tribunals/overview-ad-hoc-tribunals.htm

[6] Dema ku Şerê Cîhanê yê Duyemîn di sala 1945`an de qedîya, meylek berbiçav hebû ku sûcdarên şer ên Alman û Japonî ji ber hovîtî û binpêkirinên ku wan di dema şer de kirine ceza bikin. Serkirdeyên hevpeymanan zêdetir ji carekê daxwaza xwe ji bo welatên sereke, bi taybetî serkirdeyên leşkerî yên wan, ji bo wergirtina sizayên guncaw ji bo tawanên xwe yên li dijî aştî û mirovahîyê dîyar kirin. Li gorî vê yekê, Dadgeha Leşkerî ya Navneteweyî ji bo darizandina sûcdarên şer ên ji hêzên alîyê Ewropayê di çarçoveya Peymana Londonê de, ku bi navê Dadgeha Nurnbergê tê naskirin, hat avakirin. Dadgeha Leşkerî ya Navneteweyî ji bo darizandina sûcdarên şer ên li Rojhilata Dûr, ku wekî Dadgeha Tokyo tê zanîn. Binêre: علي وهبي ديب،" المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، منشورات الحلبي الحقوقية، الطبعة الأولى 2015

venêrînkirina hovîtî û kuştinên ku di dema pevçûnan de li Yugoslavyaya berê, Ruanda (Dadgeha Navneteweyî ya Yugoslavyaya Berê û Dadgeha Navneteweyî ya ji bo Ruanda), Tîmora Rojhilat, Sierra Leone, Kamboçya û Libnan hatin damezirandin[7].

Dadgehên tawanan ên taybet xwedî taybetmendîyeke demkî ne, û desthilata wan bi vekolînkirina tawanên ku di dema pevçûnek taybet de hatine kirin an vekolînkirina tawanek taybet sînordar e. Ev dadgeh bi biryara Encûmena Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî, weke biryara jimare 827 a sala 1993, ku li gorî wê Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî ya ji bo Yugoslavyaya Berê hat avakirin, tên damezirandin. Ev dadgeha navneteweyî bi erkê lêkolînkirina binpêkirinên giran li ser xaka Yugoslavyaya berê û dadgehkirina sûcdarên wan hatibû erkdarkirin. Heman tişt ji bo Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî ya ji bo Ruandayê jî derbas dibe, ku li gorî biryara jimare 955 a sala 1994`an hatîye damezrandin, û bi pêkanîna rêkarên lêkolîna li ser tawanên jenosîd, tawanên li dijî mirovahîyê û tawanên şer ên ku li Ruanda hatine kirin û dadgehkirina sûcdarên wan hatibû erkdarkirin. Her wiha dadgeha taybet bo Libnanê jî, li gor biryara jimare 1644, ji bo dadgehkirina kesên tawanbar bi cîbicîkirina kuştina 14ê Sibata 2005`ê, ku bû sedema kuştina 22 kesan, ji wan serokwezîrê berê yê Libnanê Refîq Herîrî[8].

Dêmek ji dawîya sedsala bîstan ve, Encûmena Ewlekarîyê dadgehên navdewletî yên taybet (şaxê yekem), û her wiha hin dadgehên têkil li gorî rêkeftinên di navbera dewletên têkildar û NY (şaxê duyem) damezirandin. Ev yek pirseke sereke di serê mirov de çêdike, ku gelo pêkan e girtîyên DAIŞ`ê yên li bakur û rojhilatê Sûrîyayê li pêşberî dadgeheke navdewletî ya taybet (xwerû yan têkil) werin dadgehkirin?.

### Şaxê yekem: Derfeta damezirandina dadgeheke navdewletî ya taybet "xwerû"

Damezirandina dadgehên navdewletî yên xwerû, yek ji hewldanên NY di mijara cezakirina kesên ku sûcên navdewletî kirine de bû. Xwesteka

[7] انظر: ولد يوسف مولود،" محاربة الإفلات من العقاب في إطار الجيل الثالث من المحاكم الجنائية الدولية: المحاكم المدولة أو المختلطة"، دفاتر السياسة والقانون، العدد 19 حزيران 2018.

[8] Encûmena Ewlekarîyê bêtir ji yek biryarê der barê dadgehkirina tawankarên şer de derxistîye, her wekî biryara wê ya jimare 1593 derbarê dadgehkirina tawankarên şer li Darfur, û biryara wê jimare 1315 derbarê dadgehkirina tawankarên şer li Sierra Leone, û hin biryarên din.

bicihanîna edalet û cezakirinê bi rêya dadgehên navdewletî encam dide ji ber ku karîna dadgehên niştimanî ya çareserkirina van sûcên xeternak nîne. Di vê derbarê de, Carla del Ponte, endama komîteya lêkolînê ya Netewên Yekbûyî li Sûrîyayê û dozgera berê ya dadgeha tawanan bo Yugoslavîyaya berê dibêje: " NY dikar bi damezirandina Dadgeha Tawanan a navdewletî ya taybet li herêmê (Îraq û Sûrîya) rêyeke herî baş a dadgehkirin û cezakirina gelek sûcdarên di nava şerê heyî de yê li herêmê pêşkêş bike".

Ji dadgehên navdewletî yên taybet û xwerû[9] yên herî navdar jî herdu dadgehên tawanan ên berê yên Yugoslavyaya berê û Ruandayê ne. Di 25`ê Gulana 1993`yan de Encûmena Navdewletî biryara jimar (827) di rûniştina xwe 3217`an de stand û tê de tekezî li ser damezirandina dadgeheke tawanan a navdewletî ji bo darizandina kesên bi pêkanîna sûcên mezin li Yugoslavyaya berê ji sala 1991`ê de kir, çimkî ev gav weke rêkareke ne-leşkerî[10] tê hesibandin, û bi rêya wê tekezî li ser parastina aştî û ewlehîya navdewletî tê kirin, her wiha wan vedigerîne rewşa wan a normal, û bi rêya wê pergala bingehîn a dadgehê tê pesendkirin[11].

Di Tîrmeha 1994an de, Encûmena Ewlekarîyê biryara hejmar (935) derxist ku komîteyek ji pisporan pêk tê ji bo lêkolînkirina binpêkirinên xeternak ên qanûna mirovî ya navdewletî li Ruandayê[12]. Komîteyê di 4ê Çirîya Pêşîn a sala 1994an de raporta xwe ya yekem pêşkêşî sekreterê giştî yê Netewên Yekbûyî kir û di 9ê Çileya Pêşîna 1994ê de jî raporteke dawîn pêşkêşî heman alîyî kir. Li gorî wan herdu raportan, Encûmena Ewlekarîyê biryara hejmar (955) derxist, û li ser esasê wê biryarê Dadgeha Tawanan a navdewletî hat damezirand, ew jî da ku berpirsên pêkanîna komkujîyan û binpêkirinên din ên qanûna mirovî ya navdewletî li Ruandayê werin dadgehkirin. Her wiha li ser esasê heman biryarê pergala bingehîn a dadgeha mijara gotinê hat pesendkirin[13].

[9] إيلينا بيجيتش، "المساءلة عن الجرائم الدولية: من التخمين إلى الواقع"، المجلة الدولية للصليب الأحمر، مختارات من أعداد 2002.

[10] Li gorî madeya 41`ê ya hevpeymana NY.

[11] Biryara Encûmena Ewlekarîyê ya jimar 827 ku di rûniştina xwe ya 3217, di 25`ê Gulana 1993`yan de stand.

[12] Biryara Encûmena Ewlekarîyê ya jimar (935) ku di rûniştina xwe ya 3400, di 1`ê Tîrmeha 1994`an de derxist.

[13] يلينا بيجيتش، "المساءلة عن الجرائم الدولية: من التخمين إلى الواقع"، مرجع سابق.

Ji ber vê yekê, ji alîyê teorîk û qanûnî ve, pêkan e ku Encûmena Ewlekarîyê desthilatên xwe ji bo parastina aştî û ewlehîya navdewletî[14] bi kar bîne û biryara avakirina dadgeheke tawanan a taybet ji bo dadgehkirina endamên Dewleta Îslamî li Îraq û Şamê (DAIŞ) bide û li binpêkirin û sûcên ku vê rêxistinê kirine her wekî sûcên şer û sûcên der-mirovî û komkujî binêre, bi taybetî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê[15].

Lê belê, divê em hin pirsgirêkên ku bûne sedema rexnekirina dadgehên navneteweyî yên taybet "Xwerû" jî destnîşan bikin. Pirsgirêka herî nîgeran ew e ku rêkarên li pêşîya dadgehên taybet, ku berê derketibûn pêş , pir dirêj bûn û bi bîrokrasîyê hatin binavkirin, û dema "qebûl" a dadgehan, ku li gorî pîvanên mafên mirovan û hiqûqa navneteweyî tê xwestin, derbas kir. Gelek bersûc zû negihan dadgehkirinê û bi derengmayînê re rû bi rû man, vê yekê hişt ku gelek kes ji wan wextekî dirêj û neqebûlkirî girtî bimînin berîya bên dadgehkirin. Ji alîyekî din ve van dadgehan bal kişand ser mûhasebekirina sûcdarên asta nizm an navîn[16]. Mînak hin biryarên Dadgeha Yûgoslavyaya berê di derbarê darizandineke adil de bi nakok bûn, ji ber ku di vî biwarî de hate destnîşankirin ku şahidên nenas hatine bikaranîn û destûr nayê dayîn ku şahid nasnameya xwe eşkere bikin. Vê yekê nakokîyên mezin derxist, nemaze ji ber şahidîya sexte ya yek ji şahidên parastî[17].

Li rex wê yekê, rexneyeke din li dadgehên navdewletî yên taybet hat kirin, ew jî ev bû: ne-bêalîbûna dadweran ku weke pêwîstîyeke girîng a dadgehkirina adil tê zanîn. Çimkî ev dadgehên han bi rêya lihevkirineke sîyasî ya di navbera endamên daîm yên Encûmena Ewlekarîyê hatin damezirandin, îcarê ji ber vê yekê ev dadgehên han heta astekê dadgehine sîyasî ne[18]. ji wê yekê zêdetir, ev dadgehên taybet bi xwezaya xwe demkî ne, û bê nêrîna adaletê bi awayekî giştî û adaleta cezayî bi awayekî taybet dadgehek were damezirandin ji bo sûcên ku berîya ev dadgeh hebûn encam dabin, çimkî nabe rêgeza

---

[14] Madeya 41`ê ji Hevpeymana NY.

[15] راجع: مركز الفرات للدراسات،" انتهاكات تنظيم داعش في شمال وشرق سوريا... التَّوصيف القانوني والمحاكم المختصّة (الجزء الأوّل)"، متوفر على العنوان التالي:https://firatn.com/?p=4045

[16] راجع: ولهي المختار،" القضاء الدولي الجنائي...والانتهاكات الجسيمة للقانون الدولي الإنساني"، منشورات الحلبي الحقوقية، بيروت، الطبعة الأولى 2020.

[17] علي وهبي ديب، "المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، مرجع سابق.

[18] Heman jêder.

bingehîn a qanûna tawanî were binpêkirin an derbaskirin, ev rêgezê bi qedexeya paşveçûna qanûnên cezayî[19].

Li gorî tişta derbasbûyî, dixuye ku damezirandina dadgeheke taybet a dadgehkirina endamên DAIŞ`ê bi biryareke ji Encûmena Ewlekarîyê dibe ku rastî heman rexneyên ku arasteyî herdu dadgehên navdewletî yên taybet bi Yûgoslavyaya berê û Ruanda were. Ev ji bilî nebûna vîneke navdewletî ya derbarê hesabpirsîna kesên sûc li Sûrîyayê bi giştî û bi taybet li bakur rojhilatê wê kirine, ev ji alîyekî ve. Lê ji alîyekî din ve gerek e hemû endamên daîm ên Encûmena Ewlekarîyê li ser vê mijarê li hev bin da ku ti alî mafê Vetoyê bi kar neyîne, bi taybet ji alîyê Rûsya û Çînê ve, da ku her astengîyeke li pêşîya biryareke bi vî rengî ji holê rabin, çimkî ji destpêka şerê Sûrîyayê ve, 2011`an, em mesele bi vî rengî bi rê ve diçe. Encûmena Ewlekarîya Navdewletî alîyê tekane yê sîyasî ye ku li gorî berjewendîyên endamên xwe yên daîm û li dora meseleyên sîyasî dixebite. Lê dibe ku di mijara dadgehkirina sûcdarên DAIŞ`ê, hemû dewletên daîm ên encûmenê li ser meseleya cih û kesayetî ya dadgeha taybet li hev nekin, ew jî ji ber hestîyarîya helwestên van dewletan der barê Sûrîyayê de.

### Şaxê Duyem: Damezirandina dadgeheke navdewletî ya taybet "têkil"

Li hember rexneyên ku li dadgehên Yugoslavyaya berê û Ruanda hatin kirin, cûreyek din ji dadgehên tawanên taybetî yên di pergala dadwerîya tawanan a navdewletî de derketin, ev dadgeh bi navê dadgehên tawanê yên têkil (Mixed) an hevbend (Hybrid)[20] in. Ev cure dadgeha navdewletî taybetmendîyên dadgehên tawanên navdewletî û dadgehên tawanên niştîmanî bi hev re li xwe digire, çi li ser mekanîzmeya damezrandin wan an jî sazkirina wan, an tawanên di bin desthilata wan de, ku tê de tawanên ku binpêkirinên xeternak ên qanûna mirovî ya navneteweyî û qanûnên mafên mirov ên navneteweyî ne, yan qanûnên navxweyî yên van welatan[21].

---

19 ولهي المختار،" القضاء الدولي الجنائي...والانتهاكات الجسيمة للقانون الدولي الإنساني"، مرجع سابق.

20 ولد يوسف مولود،" محاربة الإفلات من العقاب في إطار الجيل الثالث من المحاكم الجنائية الدولية: المحاكم المدولة أو المختلطة"، مرجع سابق.

21 علي وهبي ديب، "المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، مرجع سابق.

Ev cure-dadgehên navdewletî[22] di pêkanîna edaletê de alîkar in û di meseleya kirina bersûcan ji sûcên navdewletî re, her wiha cezakirin, dadgehkirin û hisabpirsînê de xwedî roleke berbiçav in. li nik wê, ev dadgeh çareyan ji pevçûn û pevketinên navxweyî re jî dibînin[23].

Dadgehên taybet ên navdewletî yên têkil an bi biryara Encûmena Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî têne damezrandin, an jî birêveberîyek veguhêz an demkî ya bi ser Neteweyên Yekbûyî ve dikare bi vî rengî dadgehan li ser bingeha Beşa VII ya Peymana Neteweyên Yekbûyî ava bike. Piştî pevçûnê, dewleta pêwendîdar di rewşekê de ye ku hemû sazî û dezgehên xwe yên hikûmî têkçûye, û nikare an jî naxwaze dadgehê damezrîne, ji ber vê yekê, Neteweyên Yekbûyî qonaxa veguhêz hêsan dike û dewleta hilweşîyayî radestî birêveberîyeke navdewletî dike, û ji bo damezirandina dadgeheke taybet a têkil alîkarî tê pêşkêşkirin da ku li binpêkirin û tawanên ku di heyama şer an jî şerê navxweyî de hatine kirin binere.

Dêmek damezirandina dadgeheke navdewletî ya têkil pêwîstîya xwe bi rêkeftineke di navbera NY û dewletên pêwendîdar de heye, yan jî biryarek ji Encûmena Ewlekarîya Navdewletî. Lê, hikûmeta sûrîyayî dê li ser damezirandina dadgeheke têkil ku li ser xaka sûrî bixebite erê neke, her wiha Encûmena Ewlekarîya Navdewletî jî dê nikaribe biryareke bi vî rengî bistîne madem Vetoya rûsî û çînî heye[24].

---

[22] Ev cure dadgeha navdewletî jî gelek kêmasîyên xwe hene ku ya herî girîng tirsa ji destwerdana sîyasî ya navxweyî ye, nemaze li welatên ku qeydên wan ên serxwebûna dadwerîyê lawaz in. Di heman demê de ew mêldarê tevlihevî û kêmasîyê ne ji ber ku ew gelek pergal û karmendên qanûnî yên bi paşxane, perwerdehî û nêzîkatîyên dadwerîyê yên cihêreng tevlihev dikin. Dibe ku yekbûna alîyên dadwerî yên navneteweyî û navxweyî bibe sedema pirsgirêkan di hevkarîya di navbera hêmanên neteweyî û navneteweyî de, û dadger bi felsefeyên cihêreng bixebitin, û dadwerên navneteweyî di derheqê qanûnên hundurîn ên dewleta navborî de agahdarî nebin, û ji bo vê cure dadgehê an jî ji bo amadekarî û perwerdehîyê dem têr nake. Di dawîyê de, dibe ku beşdarbûna dadwer û dozgerên navdewletî bêalîbûna dadgehê garantî neke, nemaze dema ku hejmara wan ji hejmara dadwerên herêmî yên di pêkhateya dadgehê de kêmtir be.

[23] ولد يوسف مولود،" محاربة الإفلات من العقاب في إطار الجيل الثالث من المحاكم الجنائية الدولية: المحاكم المدولة أو المختلطة"، مرجع سابق.

[24] Li vir divê bê zanîn ku komek pisporên yasayî yên navdewletî di destpêka alozîya Sûrîyayê de piştgirî dan fikra avakirina dadgeheke têkil ji bo şopandina binpêkirinên ku li seranserê erdnîgarîya Sûrîyayê û ji hemû alîyên şer ve hatine kirin. Di Tebaxa 2013 de, komek ji pisporên hiqûqî, ku di nav wan de serdozgerên berê yên dadgehên navneteweyî jî hebûn, pêşnûmeyek bi navê "Pêşnûmeya Chatauqua ji bo Damezirandina Dadgeha Taybet ji bo dadgehkirina

Mesele bi heman zehemtîyê ye eger em bên behsa damezirandina dadgeheke navdewletî ya têkil ji bo dadgehkirina endamên DAIŞ`ê bi rêya lihevkirineke di navbera NY û Rêveberîya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê de bikin. Çimkî, tevî ku Hevpeymana Civakî ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê li ser pergaleke sîyasî û birêveberîyeke sivîl ku hemû pêkhateyên herêmê di nav xwe de dihewîne ava bûye, her wiha tevî ku vê hevpeymana civakî ji herêm ji qonaxeke veguhêz a dictator û şerekî navxwe ber bi civakeke demokrat û azad ve bir. Li nik wê yekê, tevî ku xalên vê hevpeymana civakî jîyana sivîl û edaleta civakî diparêze û dadgehkirina adil misoger dike û cezayê bidarvekirinê qedexe dike li gorî irf û pîvanên demokrasîyê yên mafên mirov ên navdewletî, lê dîsan jî hîna li herêmên Rêveberîya Xweser gelek mesele û dosyayên ewlekarî rûbirûyî wê tên, nemaze êrîşên Tirkîyayê yên berdewam li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, ku ew bixwe li pêşîya damezirandina dadgeheke navdewletî ya têkil dibin astengî. Ev ji bilî zehemtîya pêkanîna rêkeftin an lihevkirinekê di navbera NY û Rêveberîya Xweser di derbarê damezirandina dadgeheke têkil a taybet bi dadgehkirina endamên DIAŞ`ê, çimkî gaveke bi vî rengî binpêkirina mîsaqa NY bixwe ye. Anku rêkeftineke bi vî rengî gerek e bi rêya hikûmeta Şamê be, yan jî dê weke binpêkirina rêgeza serwerîya dewletên ku cihê xwe di nava mîsaqa NY de digirin bê dîtin, nemaze ku hincetên damezirandina dadgeheke têkil dikeve çarçoveya jinavbirina metirsîyên van dewletên pêwendîdar di derbarê parastina serwerîya wan de ye, her wiha piştgirîkirina desthilatên dadwerî yên xwecihî û rewabûna wan e.

Ji bilî van tiştên li jor, divê bê zanîn ku di heyama ku dadgehên taybetî yên Yugoslavyaya berê û Ruanda, an jî dadgehên navneteweyî yên tevlihev, sazîyek dadrêsî ya sûcê pispor di lêkolîna sûcên navneteweyî de tune bû. Lê îro, Dadgeha Tawanan a Navdewletî heye, ku herdemî

binpêkirinên hovane, amade kirin. Mebesta wê ew bû ku dadgeheke Sûrî ya awarte bê damezirandin da ku "ew kesên ku berpirsîyarîya tawan û hovîtîyên ku li Sûrîyayê ji alîyê hemû alîyên şer ve hatine kirin. . Lê di belgeyê de tê pejirandin ku ev dadgeh tenê dikare di hundirê Sûrîyayê de kar bike dema ku rewşa sîyasî destûrê bide, piştî guhertina hikûmetê. راجع: مارك لاتايمر، شابنام مجتهدي وليانا تاكر،" خطوة نحو العدالة...خيارات المساءلة الحالية للجرائم المرتكبة في سوريا في إطار القانون الدولي"، مركز سيسفاير لحقوق المدنيين، المركز السوري للعدالة والمساءلة، أيار 2015.

ye û navenda wê li Den Haag e (Lahayî). Ji ber vê yekê baştir e ku bi biryara Encûmena Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) van tawanan radestî Dadgeha Tawanan a Navdewletî bikin, ku dikare bi lez û lêçûneke kêmtir dest bi lêkolînan bike, ji ber ku ew sazîyek berê ye û xwedîyê desthilatê ye ku li binpêkirinên giran û tawanên rêxistina terorîst a DAIŞê binêre..

- **Du: Derfeta dadgehkirina li pêşberî dadgeha Tawanan a Navdewletî:**

Dadgeha Tawanan a Navdewletî tekane[25] dadgeh e ku dikare dadwerîya tawanan li ser endamên DAIŞê, ku tawanên navdewletî li herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyayê pêk tînin, bi cih bîne[26].

Li hember rexneyên ku li dadgeha navdewletî ya taybet[27] hatin kirin, dadgeha Tawanan a navdewletî derkete holê, ew jî piştî bidawîbûna kongreyê dîplomatîk li Romayê di 17.7.1998`an de, ku tê de Rêkeftina Romayê encam da, ev rêkeftin "Pergala bingehîn a dadgeha navborî"[28] di nava xwe dihewîne. Rêkeftina Romayê bi erêkirina 120 dewletê li hemberî redkirina 7 dewletan (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Lîbîya, Îraq, Çîn, Sûrîya, Sûdan, û Îsraîl) û qedexekirina dengdanê ji alîyê 21 dewletan ve encam da[29].

Berevajî dadgehên Tawanan êm navdewletî yên taybet (Yogislavyaya berê û Runda), dadgeha Tawanan a navdewletî dadgeheke daîm e û bi rêya rêkeftineke taybet bi xwe hat damezirandin[30]. Ev dadgeh xwedî taybetîyên qanûnî yên navdewletî ye û ji gelek desthilatan pêk tê[31].

---

[25] Em amaje dikin ku Dîwana Edaletê ya Navdewletî di heman demê de dezgeheke dadwerî ya girîng e ku binpêkirinên mafên mirovan çareser dike, lê Dadgeha Navdewletî ya Dadwerî ne xwedîyê hiqûqa tawanan e û nikare kesan dadgeh bike.

راجع محمد عزيز شكري، "محكمة العدل الدولية"، الموسوعة القانونية المتخصصة، https://arab-ency.com.sy/law/details/26018/7

[26] محمد غانم إبراهيم،" دور القانون الدولي الجنائي في تجريم انتهاكات القانون الدولي الإنساني) دارسة تطبيقية تحليلية على النظام الأساسي للمحكمة الجنائية الدولية) ، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية السورية، 2022

[27] بن بوعزيز آسيا،" دور العدالة الجنائية في تفعيل مبدأ عدم الإفلات من العقاب"، مجلة الباحث للدراسات الأكاديمية، العدد صفر، آذار 2014.

[28] هورتنسيا دي. تي.جوتيريس بوسي،" العلاقة بين القانون الدولي الإنساني والمحاكم الجنائية الدولية"، المجلة الدولية للصليب الأحمر، المجلد 88-العدد 861- أذار 2006.

[29] راجع علي وهبي ديب،" المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، مرجع سابق.

[30] ساشا رولف لودر، "الطابع القانوني للمحكمة الجائية الدولية ونشوء عناصر فوق وطنية في القضاء الجنائي الدولي"، المجلة الدولية للصليب الأحمر، مختارات من أعداد 2002.

[31] يلينا بيجيتش، "المساءلة عن الجرائم الدولية: من التخمين إلى الواقع".

Peymana Dadgeha Tawanan a Navdewletî di Tîrmeha 2002`an[32] de ketîye merîyetê û desthilata vê dadgeha navdewletî heye ku çar cure tawanan binirxîne: tawanên jenosîd, tawanên der-mirovî[33], tawanên şer û tawanên destdirêjîyê (êrîşbirinê)[34].

Ji bo ku dadgeh bi peywira xwe rabe, gerek e sûc ji alîyê dewleteke ku di pergala bingehîn a dadgehê de terefdar e were rasipartin, an jî bi biryareke ji alîyê Encûmena Ewlekarîyê ve li gorî beşa heftem a mîsaqa NY[35]. Wate, Encûmena Ewlekarîyê dikare dosyaya ku rewşeke sûcê yan bêhtirî sûcekî ku di pergala dadgehê de hatine destnîşan kirin[36], hatine kirin, radestî dozgerê dadgehê bike. Destûra Romayê destnîşan dike ku Encûmena Ewlekarîyê dikare hêza xwe ya rasipartinê bikar bîne, bêyî ku ew dewleta han endamê dadgehê be an na[37].

Encûmena Ewlekarîyê berî niha ev desthilat li dijî dewleta Sûdanê bikar anîbû, piştî wergirtina raporta komîta lêkolînê ya ku li gorî biryara jimare 1593 (2005) ji bo lêkolînkirina rewşa Darfûrê[38] ava kiribû. Piştî wergirtina rapora komîteyê, Encûmenê biryar da ku rewşa Darfûrê radestî Dadgeha Tawanan bike. Di heman çarçoveyê de, Encûmena Ewlekarîyê di Sibata 2011an de biryara jimare 1970 derxist û tê de dozgerê giştî yê dadgeha navdewletî daxwaza vekirina lêkolîneke taybet li ser rewşa Lîbyayê[39], piştî şoreşên "Bihara Erebî" kiribû.

Derbarê tawanên DAIŞê li navçeyê, serdozgera (Fatou Bensouda) li Dadgeha Tawanan a Navdewletî (4/8/2015)[40] ragihand ku ew hîn ne

---

[32] Tora Medyayî ya BBC, "Dadgeha Tawanan a navdewletî: çi ye û çi bi destê wê tê? 19`ê Adara 2023. Li gorî pergala Romayê: di roja yekem ji meha piştî roja şêstî ji dîroka danîna belgeya şêstî jib o pesendkirina rêkeftinê li cem emîndarê giştî yê NY dikeve merîyetê. Dewletên ku ev pergal qebûl kirine 60 in, ew jî di dîroka 11`ê Nîsana 2002. Lewra bi vê yekê dadgeh di dîroka yekê Tebaxa 2002`an ketîye merîyetê.

[33] هبة عجوب،" جريمة الإبادة الجماعية والجرائم ضد الانسانية في ظل نظام روما الأساسي "دراسة مقارنة"، مجلة جامعة تشرين، العلوم الاقتصادية والقانونية، المجلد 44، العدد 1، 2022.

[34] المادة الخامسة من نظام روما الأساسي، راجع: بشار رشيد،" المسؤولية والعقاب على جرائم الحرب في نظام روما الأساسي"، مجلة الدراسات القانونية والسياسية – العدد 5 – المجلد 2-كانون الثاني 2017، إبراهيم دراجي،" جريمة العدوان"، مرجع سابق.

[35] إبراهيم دراجي،" المحكمة الجنائية الدولية"، مرجع سابق.

[36] Madeya 13`an a Pergala Romayê ya bingehîn.

[37] بشار رشيد، "المسؤولية والعقاب على جرائم الحرب في نظام روما الأساسي"، مرجع سابق، فاضل الغراوي،" انتهاكات داعش للقانون الدولي الإنساني"، مركز الرافدين للحوار، الطبعة الأولى، بيروت/النجف، 2023، مرجع سابق.

[38] المحكمة الجنائية الدولية، مكتب المدعي العام،" التقرير الثاني عشر للمدعي العام للمحكمة الجنائية الدولية إلى مجلس الأمن التابع للأمم المتحدة عملاً بقرار مجلس الأمن رقم 1593(2005)، https://www.icc-cpi.int/sites/default/files/NR/rdonlyres/F66BDD95-C599-4083-B19C-272662872E11/282793/

[39] القرار 1970، تاريخ 26 شباط 2011.

[40] Cour penale international ": Déclaration du Procureur de la Cour pénale internationale, Mme Fatou Bensouda, à propos des crimes qui auraient été commis par l’EIIS للمحكمة متوافر على العنوان الالكتروني ،"

amade ne lêkolînekê derbarê tawanên ku DAIŞê bi encamdana wan tê tometbarkirin li Îraq û Sûrîyayê veke, di nav de tawanên jenosîdê jî, ji ber ku desthilata wê ya dadwerî nîne, her wiha Sûrîya û Îraq ji welatên ku peymana Romayê ya damezrandina Dadgeha Tawanan a Navdewletî îmze nekirine ne, ku ev yek dadgehê ji desthilata dadwerî ya pêwîst bêpar dihêle[41]. Li hember wê, NY daxwaz kirk u sûcên DAIŞ`ê ji bo Dadgeha Tawanan a navdewletî bên şandin[42], her li gorî raporteke Encûmena Mafên Mirov a bi ser NY ve, gerek e "em mesele radestî Dadgeha Tawanan a navdewletî bê kirin da ku sûcdar werin dadgehkirin"[43].

Ji bo destnîşankirina rol û beşdarîya Encûmena Ewlekarîyê di dadgehkirin û cezakirina endamên DAIŞ`ê yên bi encamdana sûcên navdewletî yên bi ser madeya pêncan a pergala bingehîn a Dadgeha Tawanan a navdewletî ve hatine tawanbarkirin, em dê vê beşê lêkolînê dabeşî du şaxan bikin: yek: em dê behsa çawanîya rasipartina Encûmena Ewlekarîyê ji sûcên DAIŞ`ê ber bi Dadgeha Tawanan a navdewletî ve. Du: em dê behsa astengîyên li pêşîya evê prosesa rasipartinê bikin.

## Şaxê Yekem: Çawanîya rasipartina sûcên DAIŞ`ê ji alîyê Encûmena ewlekarîyê ve

Dadgeha Tawanan a navdewletî peywira xwe li gorî xala (B) a madeya 13`an ji pergala bingehîn a dadgehê bixwe bi kar tîne, lê eger Encûmena Ewlekarîyê rewşeke ku tê de sûcek an çend sûcên di çarçoveya pisporîya wê de hatine encamdan[44] rasipartî dozgerê giştî bike. Ev yeka han merc

---

الجنائية الدولية، https://www.icc-cpi.int/fr/news/declaration-du-procureur-de-la-cour-penale-internationale-mme-fatou-bensouda-propos-des-crimes

[41] Berdewam kir û got: "Lê ew dikare bi hezarên endamên rêxistina DAIŞ`ê, yên ku ji welatên li ser pergala Romayê ya bingehîn îmze kirine darizîne, bi taybet endamên rêxistinê yên ji Ewropayê".
راجع، موقع قناة العربية،" الجنائية الدولية "غير مستعدة" للتحقيق في جرائم داعش، متوفر على العنوان التالي، https://www.alarabîya.net/arab-and-world/iraq/2015/04/08/ ،Daniel Ciccia. ،" Daech: l'aveu d'impuissance de la Cour pénale internationale

La procureure de la CPI s'est exprimée mercredi sur son impuissance face aux crimes commis par les djihadistes du groupe Etat islamique. Décryptage par notre contributeur "، متوفر على العنوان التالي: https://www.lexpress.fr/informations/daesh-l-aveu-d-impuissance-de-la-cpi_1669466. html Publié le 09/04/2015 à 11:15, mis à jour le 22/04/2015 à 11:54

[42] رائد عبيس،" منهجية الأمم المتحدة في التصنيف والتحقيق بجرائم داعش، "المركز العراقي لتوثيق جرائم التطرف، متوفر على العنوان التالي: https://iraqicenter-fdec.org/archives/3225

[43] الأمم المتحدة، مجلس حقوق الانسان: جرائم داعش بحق الإيزيديين قد تعتبر إبادة، https://hritc.co/11083

[44] Xala 13 ya yasaya Dadgeha Tawanan a Navdewletî, ku dibêje: “Dadgeh dikare di derbarê tawanên ku di xala 5’an de hatine behskirin, li gorî bendên vê destûrê di van rewşên jêrîn de hiqûqa xwe bi kar bîne: ... B- Ger Encûmena Ewlekarîyê ya ku li gorî Beşa Heftemîn tevdigere, li gorî Peymana Neteweyên Yekbûyî be, rewşek ji dozger re tê şandin ku yek an çend ji van sûcan tê de xuya dike ku hatine kirin.”

xwe heye, ew jî ku dive Encûmena Ewlekarîyê li gorî beşê heftan ji peymana NY tev bigire, ev jî di çarçoveya berpirsyartîya Encûmena Ewlekarîyê ya girêdayî parastina aştî û ewlehîya navdewletî de[45].

Bi gotineke din, eger Encûmena ewlekarîya Navdelwetî dît ku sûcek an zêdetirî sûcekî ji sûcên ku dikevin çarçoveya karê Dadgeha Tawanan a navdewletî[46] hatine kirin, û li dijî aştî û ewlekarîya navdewletî bûne gefek, gerek e Encûmen bi peywir û karê xwe rabe û wan sûcan bispêre dozgerê giştî yê Dadgeha Tawanan a navdewletî, lê divê ev rêkarê han aştî û ewlekarîya navdewletî biparêze[47]. Encûmen li gorî beşa heftem a peymana NY tev digere, nemaze di milê danîna rêkarên ne-leşkerî, ew jî li gorî madeya 41`ê ya Peymana NY[48], her wiha li gorî madeya 13`an /B/ jj pergala bingehîn a Dadgeha Tawanan a navdewletî[49].

Sekreterê Giştî yê Netewên Yekbûyî di gelek raportên xwe de tekezî li ser wê yekê kirîye ku DAIŞ li dijî aştî û ewlehîya navdewletî metirsîyek e. Her wiha di biryara xwe ya bi jimare 2249 de ku Encûmenê piştî êrîşên terorîst ên DAIŞê li (Fransa û Misir) derxistîye, Encûmena Ewlekarîya Navdewletî amaje bi wê yekê kirîye ku karînîya vê rêxistinê heye ku gefan li cîhanê bike û ev yek li dijî aştî û ewlehîya navdewletî gefek e. Her wiha Encûmenê di hemû biryarên xwe yên derbarê DAIŞê de tekezî li ser şermezarkirina terorîzmê bi giştî û şermezarkirina tawanên DAIŞê kir, û daye dîyarkirin ku pêwîst e hemû welat û rêxistinên navdewletî û herêmî bi awayekî bibandor ji bo rêgirtin, lawazkirin, dûrxistin û felckirina gefên terorîstan beşdar bin.

Ji alîyekî din ve û li gor biryarên Encûmena Ewlekarîyê, dibe ku tawanên ku li Iraq û Sûrîyayê li dijî kêmarên olî û etnîkî tên kirin, bigihin asta tawanên şer, tawanên der-mirovî û jenosîdê. Di van biryaran de, Encûmenê tekezî li ser pêwîstîya hesabpirsîna kesên ku binpêkirina yasaya mirovî ya navdewletî kirine yan tecawzî kirine yan jî mafên mirov binpê kirine.

---

45 Û li gorî bicihanîna madeya 39`an ji peymana NY.

46 Madeya 5`an ji pergala Romayê ya bingehîn.

47 غسان علي علي، ميلاد أديب عثمان،" تطور نظرية المسؤولية الدولية"، مجلة جامعة تشرين، العلوم القانونية والاقتصادية، المجلد 44، العدد 4، 2022.

48 علاق نجيمة،" إعاقة دور المحكمة الجنائية في مكافحة الإفلات من العقاب "، مجلة المعيار، المجلد 26، العدد 7، 2022.

49 زرقط عمر، "اختصاص المحكمة الجنائية الدولية في نظر جرائم الإرهاب الدولي"، مجلة الحقوق والعلوم الإنسانية، العدد 25، المجلد الأول.

Dema ku Encûmena Ewlekarîyê ya NY piştrast dike ku dibe ku tawanên DAIŞê bibin tawanên şer, tawanên li dijî mirovatîyê û jenosîd, û ew rêxistin metirsîyek e li ser aştî û ewlehîya navdewletî, li vir, divê Encûmen erkên xwe di vî warî de bi cih bîne, bi şandina dosyaya tawanên DAIŞê bo Dadgeha Tawanan a Navdewletî, ya ku desthilata wê ya bingehîn heye ji bo lêkolînkirina tawanên wiha. Bi taybetî ku Encûmena Ewlekarîyê xwedîyê desthilatê ye ku ji bo cîbicîkirina yasaya Roma ya avakirina vê dadgeha navdewletî, tawanên DAIŞê radestî vê dadgehê bike[50].

Lê li gorî madeya 17`an ji pergala bingehîn a Dadgeha Tawanan a navdewletî, gerek e rasipartina ku Encûmena Ewlekarîyê bike di çarçoveya prensîba "Pisporîya pêvek"[51] de be. Anku, pisporîya Dadgeha Tawanan a navdewletî pisporîyeke temamker a pisporîya dadwerîya niştimanî ye. Ev yeka han bi rêya madeya yekem a pergala Romayê ya bingehîn hat tekezkirin, ku pisporîya dadgehê weke "temamkera wîlayeta dadwerî ya tawanîya niştimanî"[52] hat dîtin, û ev prensîb tê wateya ku pisporîya Dadgeha Navdewletî nakeve şûna pisporîya dadgehên niştimanî[53]. Ji ber vê yekê, li pêşberî Dadgeha Tawanan a navdewletî gilî nayê qebûlkirin eger dewlet xwedîya pisporîya di dozê de be û bi rastî jî dest bi lêpirsîn an dadgehkirinê kirîye, yan jî wê dewletê birîyar dabe ku ev kes nayê dadgehkirin eger lêpirsînên girêdayî gilî bi dawî nebûbûn, an berîya niha heman kes bi heman mijarê hatibe dadgehkirin, yan jî ew xeterîya mezin a gilî tune be da ku dadgeh ti rêkarekî din bi cih bîne[54].

Nexwe, li gorî bicihanîna prensîba "Pisporîya Temamker", Encûmena Ewlekarîyê nikare dest bi ti rêkarekî pêwîst der bare prosesa raspartina li dadwerê giştî yê dadgehê bike heta ku neyê xuyakirin ku dewleta pêwendîdar nikare yan jî naxwaze lêpirsîn û dadgehkirinê bike[55], çimkî

[50] Madeya 13 ji beşê B ji pergala Romayê ya bingehîn.

[51] لؤي محمد حسين النايف "العلاقة التكاملية بين المحكمة الجنائية الدولية والقضاء الوطني"، مجلة جامعة دمشق للعلوم الاقتصادية والقانونية، المجلد 27، العدد الثالث، 2011.

[52] كزافييه فيليب "العقاب على انتهاكات القانون الدولي الإنساني: إشكالية توزيع الاختصاص فيما بين السلطات الوطنية والسلطات الدولية" المجلة الدولية للصليب الأحمر، المجلد 90، العدد 870، حزيران 2008.

[53] مخلط بلقاسم،" حدود التعاون بين المحكمة الجنائية الدولية والقضاء الوطني في مكافحة الإفلات من العقاب"، مجلة العلوم القانونية والاجتماعية، المجلد الرابع-العدد الرابع، كانون الأول 2019.

[54] Madeya 17-1 ji pergala Romayê ya bingehîn.

[55] هورتنسيا دي. تي.جوتيريس بوسي،" العلاقة بين القانون الدولي الإنساني والمحاكم الجنائية الدولية"، مرجع سابق.

wê demê gilîyê girêdayî rewşa mijara gotinê li pêşberî dadgehê nayê qebûlkirin[56].

Hêjayî gotinê ye ku desthilata Encûmena Ewlekarîyê ya girêdayî rasipartina ber bi dadgehê ve ji bo hemû dewletan derbasdar e, di nav de dewletên ku di pergala Dadgeha Tawanan a navdewletê[57] de ne endam in jî. Ev tê wê wateyê ku Encûmen dema desthilatîya xwe ya rasipartinê bi kar tîne ji bilî prensîba "pisporîya temamker" û qeydê girêdayî "gefa li ewlekarî û aştîya navdewletî"[58], rastî ti qeyd û bendan nayê. Û li ser vî esasî, Encûmen dikare her rewşekê bispêre dadgehê bêyî ku cihê çêbûna sûc an nasnameya sûcdar li ber çavan bên standin.

Li gorî tişta me li jorê gotî, ji alîyê teorîk ve mimkun e ku tawanên DAIŞê yên li herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyayê hatine kirin, bo Dadgeha Tawanan a Navdewletî bên radestkirin, tevî ku Sûrîyayêa bixwe yasaya dadgehê[59] pesend nekirîye. Mînaka herî baş ji bo vê yekê jî rasipartina rewşa Darfûrê bo dadgehê li gor biryara Encûmena Ewlekarîyê ya jimar 1593 ya sala 2005an[60], her wiha û rasipartina rewşa Lîbyayê li gor biryara jimar 1970 ya sala 2011ê, tevî ku Sûdan û Lîbya ne dewletên îmzekarê Peymana Romayê ne[61].

Îcarê li vir ev pirs xwe dide pêş: Piştî ku Encûmena Ewlekarîyê û Sekreterê Giştî yê Netewên Yekbûyî dan xuyakirin ku DAIŞ gefê li aşitî û ewlehîya navdewletî dixwe, û bi berçavgirtina tawanên ku DAIŞê li bakur û rojhilatê Sûrîyayê pêk anîne di bin desthilata dadgeha Tawanan a navdewletî de ye, wê demê çima dosyaya tawanên vê rêxistinê ji dadgeha tawanên navdewletî re nehatîye şandin?[62] Bi gotineke din, çi astengî li pêşîya Encûmena ewlekarîya Navdewletî hene ku erkên xwe di parastina

56 سعيد طلال الدهشان، " عقبات قانونية تعيق عمل المحكمة الجنائية الدولية"، مجلة العلوم السياسية والقانون. العدد 20، المجلد 04، كانون الثاني 2020.

57 علي وهبي ديب، "المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، مرجع سابق.

58 ساعد العقون،" تقييم نظام الادعاء امام المحكمة الجنائية الدولية"، مجلة الحقوق والعلوم الإنسانية، https://www.asjp.cerist.dz/en/article/44284

59 أحمد سي علي، "مدى فعالية النظام الأساسي للمحكمة الجنائية الدولية في تحريك الدعاوى ضد منتهكي القانون الدولي الإنساني"، https://www.asjp.cerist.dz/en/article/64264، بلواس مريم،" النزاع السوري واختصاص المحكمة الجنائية الدولية بمتابعة مرتكبي جرائم الحرب"، المجلة الأكاديمية للبحث القانوني، العدد 2، 2018، https://www.asjp.cerist.dz/en/article/71037

60 Ev biryara han bi erêkirina 11 endaman ji endamên Encûmena Ewlekarîyê encam da, her wiha 4 endam bê deng man û dengê xwe nedan, di nava wan de Amerîka û Çîn.

61 مهند علي الإبراهيم،" قواعد الإثبات أمام المحكمة الجنائية الدولية "دراسة تطبيقية على بعض القضايا المنظورة أمام المحكمة الجنائية الدولية"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية السورية، 2022.

62 راجع، هيومن راتس ووتش،" سوريا والمحكمة الجنائية الدولية: أسئلة وأجوبة"، أيلول 2013، متوفر على العنوان التالي: https://www.hrw.org/ar/news/2013/09/17/251132

aştî û ewlehîya navdewletî de bi cih bîne û dosyaya tawanên DAIŞê radestî dadgeha Tawanan a navdewletî bike hene?

### Şaxê Duyem: Astengîyên radestkirina tawanên DAIŞ`ê bo Dadgeha Tawanan a Navdewletî

Rasipartina rewşeke destnîşankirî ji alîyê Encûmena Ewlekarîyê ve bo Dadgeha Tawanan a navdewletî ne karekî hêsan e û gelek astengîyên xwe hene[63], hin girêdayî desthilatên Encûmena ewlekarîyê bixwe ne, û hin jî girêdayî desthilatên dewletên ku endamên Encûmenê yên daîm in[64].

### Yek- Astengîyên girêdayî desthilatên Encûmena ewlekarîyê

Pergala bingehîn a Dadgeha Tawanan a navdewletî desthilatin kirin destê Encûmena ewlekarîyê de û ev desthilat mîna astengîyên li pêşîya xebatên Dadgeha Tawanan a navdewletî yên der barê lênêrîna sûcên navdewletî yên xeternak de tên dîtin[65].

Ji alîyekî ve, û li gorî madeya 16`an ji pergala Romayê ya bingehîn, Encûmena Ewlekarîyê dikare rêkarên Dadgehên rawestîne, ew jî bi "Paşêxistina rêkarên dadgehê"[66] tê binavkirin. Ev desthilata di destê Encûmena Ewlekarîyê de weke "xeterîyeke mezin"[67] tê dîtin; çimkî tevgera dadgehên felic dike û rola wê ya lêpirsîn, dadgehkirin û rêgirtina li ber ne-hisapirsîna li ser sûcên navdewletî yên xeternak asteng dike[68].

Di madeya 16`an a pergala bingehîn a dadgeha Tawanan a Navdewletî de hatîye gotin: Nabe lêpirsîn an dadgehkirin li gorî pergala bingehîn ku heta 12 mehan dirêj bike were destpêkirin an berdewamkirin, li gorî daxwazeke ji alîyê Encûmena ewlekarîyê bo dadgehê di vê derbarê de, anku li gorî biryarnameyeke ku ji alîyê Encûmenê ve derkeve, li gorî beşa 7`an a peymana NY. Her wiha Encûmen dikare vê xwestekê li gorî

---

63 شعنبي فؤاد،" المعوقات والبدائل الكفيلة بتكريس فعالية العدالة الجنائية الدولية" مجلة العلوم السياسية والقانون-العدد11 أيلول 2018 – المجلد2.

64 داودي منصور، "عوائق المسؤولية الجنائية في النظام الأساسي للمحكمة الجنائية الدولية"، مجلة القانون والعلوم السياسية، المجلد الخامس، العدد 1، 2019، https://www.asjp.cerist.dz/en/article/102000

65 أحمد مبخوتة، "مسار تحقيق العدالة الجنائية الدولية بين الواقع والمأمول، دراسة تحليلية على ضوء النظام الأساسي للمحكمة الجنائية الدولية"، مجلة العلوم السياسية والقانون-العدد12 تشرين الثاني 2018 - المجلد02 – المركز الديمقراطي العربي-ألمانيا-برلين، شادي جامع، "المحكمة الجنائية الدولية بين الواقع العملي والطموح القانوني"، مجلة جامعة تشرين للبحوث والدراسات العلمية _ سلسلة العموم الاقتصادية والقانونية المجمد 40 العدد 1، 2018.

66 احمد حسين، بن صالحية صابر،" معوقات المحكمة الجنائية الدولية في تحقيق العدالة"، مجلة الحقوق والعلوم الإنسانية، المجلد 15، العدد 2، 2022.

67 علاق نجيمة، "إعاقة دور المحكمة الجنائية في مكافحة الإفلات من العقاب"، مرجع سابق.

68 Heman jêder

heman mercan nû bike[69]. Dêmek, ev madeya han rê dide Encûmena Ewlekarîyê ku xebatên Dadgeha Tawanan a navdewletî rawestîne, çimkî dikare rê li ber lêpirsînê yan berdewamkirina wê yan jî vekirina dozeke li dadgeha Tawanan bê vekirin an heta salekê ev doz vekirî bimîne bigire, di heman demê de Encûmen dikare  vê taloqekirina han heta hetayê nû bike, eger tevlihevîyeke ewleyî û aştîya navdewletî bi xwe re bîne, yan jî li dijî wan bibin metirsîyek. Xeterîya vê desthilata di destê Encûmenê de ew e ku Encûmen destwerdanê di karûbarê dadgehê de dike û sîyaset û dadwerî tev li hev dibin[70]. Her wiha ne dûr e ku ev destwerdana han ji alîyê Encûmenê ve li pêşîya bicihanîna dadmendî yan li pêşîya Dadgeha Tawanan a navdewletî bixwe bibe astengî, nemaze ku li Encûmenê dualîya berjewendîyan li dar e û xwedî tevlihevî ye[71], ev di wextekî de ku desthejî û lihevkirinên navdewletî pirê caran li ser hisabê pêkanîna edaletê encam didin, ev yek bixwe li pêşîya hisapirsînê û cezakirina alîyên ku binpêkirin û sûcên navdewletî kirine, ku ev karê dadgehê ye, dibe astengî[72].

Ji alîyekî din ve, astengîyeke din li pêşîya bidestveanîna edaleta tawanî yan navdewletî heye, ew jî desthilata Encûmena Ewlekarîyê ya radestkirina rewşek an jî meseleyekê bi Dadgeha Tawanan a navdewletî li gorî xala (B) ji madeya 13`an ji pergala wê ya bingehîn e, çimkî divê li gorî beşa heftem a Peymana NY be. Ev yeka han dihêle Dadgeha Navdewletî bindestî Encûmena ewlekarîyê be û mîna sazîyeke bi ser wê ve be. Di vê der barê de hin dibînin ku desthilat an mafê Encûmena Ewlekarîyê yê radestkirina rewşekê bi dadgehê dihêle du pergalên dadwerî yên navdewletî li pêşîya vê dadgehê çêbibin[73]. Yekemîn pergala dadwerî bi însîyatîfa xwe an jî li ser daxwaza dewletek endam vekirina dozê ji hêla dozgerê giştî ve heye. Sîstema din jî bi rêya Encûmena Ewlekarîya Navdewletî ya sîyasî ye, ku di sîstema Netewên Yekbûyî de giringtirîn desteya sîyasî tê dîtin. Îcarê ji ber vê yekê, mafdayîna bo Encûmena Ewlekarîyê li gorî pergala Romayê, da ku rewşekê radestî dozgerê giştî yê dadgehê bike cihê rexneyê ye[74]. Çimkî desthilateke sîyasî

69 Madeya 16 ji Pergala Bingehîn a Dadgeha tawanan a navdewletî

70 بن بوعزيز آسيا، "دور العدالة الجنائية في تفعيل مبدأ عدم الإفلات من العقاب"، مرجع سابق.

71 Heman jêder

72 علي وهبي ديب، "المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، مرجع سابق.

73 راجع: حازم عتلم، "نظم الادعاء أمام المحكمة الجنائية الدولية"، منشور في المحكمة الجنائية الدولية –تحدي الحصانة، نقابة المحامين في بيروت –معهد حقوق الانسان-بيروت 2003، ص 119.

74 علاق نجيمة،" إعاقة دور المحكمة الجنائية الدولية في مكافحة الإفلات من العقاب"، مرجع سابق.

ya ku Encûmena Ewlekarîyê nûnertîya wê dike, mafdar dibîne ku dozeke –gerek e qanûnî be- rasipartî desteya dadwerî bike û ew jî Dadgeha Tawanan a navdewletî ye. Li gorî hin serpêhate û tecrûbeyan, dîtina Encûmena Ewlekarîyê ji hin rewşan re weke gefeke li dijî ewlehî û aştîya navdewletî re pirrê caran bandor û faktorên xwe yên girêdayî sîyasteya navdewletî[75] û berjewendîyên dewletên bibandor[76] hebûn. Wek mînak, Encûmena Ewlekairyê û di bin bandora Amerîkayê de, biryarên jimar 1422[77] û 1487[78] standin, ev herdu biryarên girêdayî efûkirina welatîyên Amerîkayê ji hisabpirsîna dadwerî ya navdewletî ne, ku bûn cihê gengeşe û nerazîbûnê[79].

**Du- Astengîyên girêdayî desthilatên dewletên endamên Encûmena Ewlekarîyê yên daîm**

Ji mercên biryara Encûmena Ewlekarîyê ya rasipartina bo dadgeha Tawanan a navdewletî ew e ku endamên daîm ên encûmenê mafê Vetoyê li dijî biryarê bi kar neyînin, ew jî li gorî madeya (27) a peymana NY[80]. Ev bendê han di rewşa normal de astengîyan li pêşîya xebata Encûmena Ewlekarîyê derdixe, eger mesele girêdayî berjewendîyên her pênc dewletên endam ên daîm an jî berjewendîyên dewletên alîgirên wan bin.

Nexwe, eger biryarek ji hêla Encûmena Ewlekarîyê ve girêdayî rasipartina sûcekî ku ji alîyê welatîyên dewleteke di pergala bingehîn a dadgehê de ne terefdar e bê kirin derkeve, yan jî sûcekî nadewletî der heqê herêmeke dewleteke di vê pergala han de ne terefdar encam bide, wê demê nabe mafê Vetoyê ji alîyê endamên daîm ên Encûmena Ewlekarîyê ve were bikaranîn.

---

75 نور الدين مورو، "طغيان واقع التسييس على عمل وفاعلية المحكمة الجنائية الدولية"، مجلة العلوم السياسية والقانون-العدد 15 أيار 2019- المجلد 10– المركز الديمقراطي العربي-ألمانيا-برلين.

76 علي وهبي ديب، "المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، مرجع سابق.

77 Biryara jimare 1422 ku ji alîyê Encûmena Ewlekarîyê ve di civîna xwe ya 4572 de ya di 12'ê Tîrmeha 2002'an de hat lidarxistin û tê de hat gotin ku qanûna Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî ku di 17'ê Tîrmeha 1998'an de li Romayê hatîye derxistin, wê di 1'ê Tîrmeha 2002'an de bikeve merîyetê. ku Dewletên ne alîgirê Pergala Romayê ne, dê berpirsîyarîya xwe di çarçoveya dadwerîyên xwe yên neteweyî de di derbarê sûcên navneteweyî de berdewam bikin.

78 القرار رقم 1487 الذي اتخذه مجلس الأمن في جلسته 4772، المعقودة في 12حزيران/ يونيو 2003، بن بوعزيز آسيا،" دور العدالة الجنائية في تفعيل مبدأ عدم الإفلات من العقاب"، مرجع سابق.

79 بارعة القدسي، "المحكمة الجنائية الدولية طبيعتها واختصاصاتها -موقف الولايات المتحدة الأمريكية وإسرائيل منها-" مجلة جامعة دمشق للعلوم الاقتصادية والقانونية– المجلد ٢٠ -العدد الثاني- 2004، علاق نجيمة، "إعاقة دور المحكمة الجنائية في مكافحة الإفلات من العقاب".

80 Xala 27 ji madeya 3`an a Peymana Neteweyên Yekbûyî dibêje: Biryarên Encûmena Ewlekarîyê li ser hemû mijarên din ji bilî mijarên rêkarî, bi dengê erê ji neh endaman têne wergirtin, tevî dengên lihevkirî yên endamên daîmî, bi şertê ku: di biryarên ku li gor Beşa VI û li gor paragrafa 3. ya Xala 52. de hatine girtin de Alîyek ku nakok e ji dengdanê dûr dikeve.

Wate, Dadgeha Tawanan a navdewletî nikare di derbarê sûcên ku li herêmeke dewletên endam ên daîm weke Amerîka, Rûsya û Çîn rapirsînê bike, di wextekî de ku ev dewletên han li ser pergala bingehîn a dadgehê heta niha pesend nekirine, yan jî ew sûcên ku ji alîyê welatîyên wan dewletan ve hatine kirin, an jî sûcên ku dibe ji alîyê hevkaran ve bên kirin, yan jî li herêmeke dewletên hevkarên wan dewletan encam bidin, eger dewletên daîm li Encûmena Ewlekarîyê mafê Vetoyê bi kar anî.

Hêjayî gotinê ye ku di nav endamên daîm ên Encûmena Ewlekarîyê de, her wiha li ser pergala bingehîn a Dadgeha Tawanan îmze kirine tenê ev in: Fransa û Brîtanîya ne. û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Çîn û Rûsya ne endamên Dadgeha Tawanan a navdewletî ne[81]. û eger Encûmena Ewlekarîyê destwerdan kir û sûcên DAIŞ`ê yên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê pêk anîne birin Dadgeha Tawanan a navdewletî, li gorî bendê heftan ê Peymana NY weke çawa berîya niha me behsa wê kir, ew dê pêwîstîya wê bi erêkirina tevaya van dewletan hebe, û nabe mafê Vetoyê ji hêla wan ve bê bikaranîn.

Lê: Gelo tevaya van dewletan dê li ser meseleya birina dosyaya DAIŞ`ê ya li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bo Dadgeha Tawanan a navdewletî erê bikin an na?

Destpêkê, divê bê zanîn ku Fransa, Amerîka û Birîtanîya ji welatên ku Hevpeymanîya Navdewletî ya li dijî DAIŞ`ê damezirandin û tê de beşdar in, ku di sala 2014`an de hat damezirandin û ji 73 dewletên şerê li dijî DAIŞ`ê li her enîyekê û jihevxistina torên wê û rêgirtina li ber xeyalên wê yên cîhanî[82] dane ser milê xwe pêk tê. Ev hevpeymanîya ku sala 2019`an bi hevkarîya QSD`ê têkibirna leşkerî ya rêxistina DAIŞ`ê li berîka wê ya dawîn li Sûrîyayê, li bajarokê Baxozê ragihand. Ji alîyekî din ve, gelek endamên DAIŞ`ê yên bi eslê xwe fransî, birîtanî û amerîkî jî hene.

Helwesta DYA ji Dadgeha Tawanan a navdewletî, ji dema ku di salên 90 ji sedsala borî[83] de hatîye damezirandin, eşkere ye, ji ber ku ev dewleta

---

[81] Malpera fermî ya Dadgeha Tawanan a navdewletî: https://www.icc-cpi.int
[82] Malpera fermî ya Hevpeymanîya Navdewletî: https://theglobalcoalition.org/ar/
[83] Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê red kir ku beşdarî wê bibe, kampanyayek li dijî wê da destpêkirin û bi dehan welat li pey şopa wê neçar kirin ku bi wê re peymanên dualî îmze bikin, ku tê de wan soz dan ku ji radestkirina her Amerîkîyek ji dadgehê û ew bi kirina tawanên şer tawanbar bike bi dûr bisekinin eger li ser xaka wê bin.."انتهاكات داعش للقانون الدولي الإنساني" فاضل العزاوي،

gewre bi ti awayî xwe neçarî xebitîna bi Dadgeha Tawanan a navdewletî re nabîne, berevajî wê, ev dewleta han li dijî vê dadgeha[84] mijara gotinê dixebite. Di serdema serok George W. Bush de qanûna parastina endamên hêzên leşkerî yên amerîkî derket, ev qanûna han bergirîyê li hevkarîya bi Dadgeha Tawanan a navdewletî dike, ew jî bi rêya qutkirina alîkarîyên leşkerî ji ser dewletên ku pergala Romayê ya bingehîn pesend kirine, her wiha rê didîyê ku çi kesekî tawanbar û ji alîyê Dadgeha Tawanan ve hatibe binçavkirin, bo Amerîkayê bê vegerandin[85].

Li gorî tişta me li jorê gotî, hebûna Amerîkayê li herêmê û beşdarîbûna wê di şerê li dijî DAIŞ`ê ku serkêşîya Hevpeymanîya Navdewletî dike, dibe ku bibe astengîyek li pêşberî mijara birina dosyaya sûcên DAIŞ`ê bo Dadgeha Tawanan a navdewletî. Lê ne tenê Amerîka dibe ku li pêşîya vê mijarê bisekine, her wiha Fransa jî weke dewleteke endama daîm li Encûmena Ewlekarîyê û pergala Romayê ya bingehîn pesend kirîye naxwaze hemwelatîyên wê yên li nav DAIŞ`ê bên dadgehkirin an dosyaya wan bo dadgeha Tawanan a navdewletî bê şandin. Hêjayî gotinê ye ku serokê Fransayê Macron bi hempîşeyê xwe yê berê, serokê Îraqê Berhem Salih re li ser dadgehkirina 13 fransîyên DAIŞ`î ku di şerê li dijî ya dawîn de hatibûn girtin li hev kiribû, ew jî li gorî qanûna li dijî terorê ya îraqî[86] û li pêşberî dozgerîya Îraqê, piştî danûstandinên wan ên 25 Sibata 2019`an.

Rûsya û Çîn wek endamên daîm ên Encûmena Ewlekarîyê bi ti awayî naxwazin ti mijarên girêdayî rewşa Sûrîyayê radestî Dadgeha Tawanan a Navdewletî bikin û divê em ji bîr nekin ku wan hêza xwe ya Vetoyê ji carekê zêdetir li ser rewşa Sûrîyayê bikar anîne. Di 22ê Gulana 2014an de, van her du endamên daîm li dijî pêşnûmeya biryareke ku Fransayê pêşkêşî Encûmena Ewlekarîya Navdewletî[87] kiribû, derbarê şandina rewşa Sûrîyayê bo Dadgeha Tawanan a Navdewletî nerazî bûn[88].

---

[84] Amerîka di 31/12/2000 de peyman îmze kir, lê di 6/5/2002 de îmzeya xwe paşve kişand û bi vê yekê piştrast kir ku tu nîyeta wê tune ku peymanê bipejirîne, pabendî prensîb û armancên dadgehê be, an jî alîkarîyê bike.. Bi rastî jî danûstandinên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi dadgehê re bi dijminatî û nehevkarîyê ve hatine binavkirin. راجع علي وهبي ديب، "المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، مرجع سابق، علاق نجيمة،" إعاقة دور المحكمة الجنائية الدولية في مكافحة الإفلات من العقاب"، مرجع سابق

[85] بارعة القدسي،" المحكمة الجنائية الدولية طبيعتها واختصاصاتها -موقف الولايات المتحدة الأمريكية وإسرائيل منها-"، مرجع سابق.

[86] ماكرون يلتقي الرئيس العراقي في 26 الجاري، خبر نشر في الموقع France24 الرسمي، https://www.france24.com/ar/

[87] حمدي حنان، شملان عبد العزيز، "تأثير حق النقض على دور المحكمة الجنائية في الحد من الإفلات من العقاب"، مجلة الحقوق والعلوم السياسية، المجلد 11، العدد 1، 2024.

[88] Amerîka û Rûsya di helwesta xwe ya li hember Dadgeha Tawanan a Navneteweyî de wek hev in. Van her du welatan îmzayên xwe ji yasaya Dadgeha Tawanan a Navdewletî vekişandine, ku li pêşîya

Kurt û kurmancî, dixuye ku desthilata dewletên endamên daîm li Encûmena Ewlekarîyê rê nade radestkirina sûcên DAIŞ`ê bo dadgeha Tawanan a navdewletî, ji ber ku ev mesele pwîstîya xwe bi erêkirina tevaya her pênc endaman û ne-bikaranîna mafê Vetoyê li dijî biryara radestkirinê heye.

Lê dîsan jî, biryara Encûmena Ewlekarîyê tenê rêyeke destnîşankirina hakimîya dozgerî ya Dadgeha Tawanan a navdewletî ye. Çimkî gengaz e her dewleteke pergala Romayê ya bingehîn pesend kiribe radestî dadgeha Tawanan a navdewletî bike, yan jî lêpirsînek di derbarê wan de ji alîyê serdozgerê giştî ve weke "destpêşxerîyeke kesane" were vekirin.

Lê eger Encûmena Ewlekarîyê bi meseleya radestkirinê ranebe wê demê Dadgeha Tawanan a navdewletî dê nikaribe pizisyona xwe ya dozgerî bi akr bîne eger ne li ser erdê be, yan li ser welatîyên wan dewletên ku pergala Romayê ya bingehîn pesend kirine, yan yên ku hakimîya dozgerî ya dadgehê li gorî madeya 12 ji beşa 3 ji pergala Romayê ya bingehîn qebûl kirine. Îcarê, eger Sûrîya li ser pergala Romayê ya bingehîn pesend neke, wê demê dê ti hakimîya dozgerî ya dadgeha Tawanan a navdewletî di hundirê erdnîgarîya Sûrîyayê de yan jî tenê li ser kesên ku nasnameya sûrî bi wan re heye tune be.

Lê belê gelek endamên rêxistina terorîst a DAIŞê ji neteweyên bîyanî yan jî Sûrîyayêyîyên xwedî hemwelatîyên dualî ne û hinek ji wan hemwelatîyên dewletên peymana Romayê ne, wek hemwelatîyên welatên Ewropayê. Ji ber vê yekê, bêyî ku derbasî Encûmena Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî bibin[89], dikarin li pêşberî Dadgeha Tawanan a navdewletî[90] rastî lêpirsînê bibin, ev ji alîyekî ve. Lê ji alîyekî din ve, welatên ne Ewropî jî hene ku alîyên Peymana Romayê ne, di nav de 4 welatên Erebî ku welatîyên wan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê tawan kirine. Weke mînak, Tûnis ku di sala 2011an de bû dewletek ji Peymana Romayê re, gelek hemwelatîyên ku bi DAIŞê re şer kirine hene. Her wiha gelek endamên DAIŞê hene ku hemwelatîyên Urdinê ne, ku di

cîbicîkirina vê dadrêsîyê ji alîyê Encûmena Ewlekarîyê ve dibe astengî eger mesele bi berjewendîyên van herdu welatan vey an welatên alîgirên wan ve girêdayî be.

[89] Conseil de l'Europe ; poursuivre et punir les crimes contre l'Humanité voire le possible génocide commis par Daech ; rapport ; 25 avril 2017; https://assembly.coe.int/LifeRay/JUR/Pdf/DocsAndDecs/2017/AS-JUR-2017-07-FR.pdf

[90] المركز الأوروبي لدراسات مكافحة الإرهاب والاستخبارات، "المقاتلون الأجانب ـ الأسس القانونية ومواثيق العهد الدولي باستعادة دول أوروبا رعاياها"، تشرين الأول 2021، متوفر على العنوان التالي: https://www.europarabct.com/

heman demê de endama destûra Romayê ye. Di vê rewşê de û der barê hemwelatîyên van welatan de wek dewleta Tûnis û Urdinê, Dadgeha Tawanan a Navdewletî dikare bêyî Encûmena Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî yan jî pêwîstîya daxwazekê ji Encûmena Ewlekarîya Navdewletî yan ji dewleta elaqedar bike, mafê xwe bikar bîne.

Tevî wê jî, wê rêkarên dadgeha Tawanan a navdewletî tenê bandorên erênî li ser dadwerî, berpirsîyarî, û nehiştina bêcezabûnê hebe bi piştrastkirina ku dadrêsîya dadgehê hemî hêmanên DAIŞê digire nav xwe, çi ew hemwelatîyên dewletên ku Peymana Romayê ne an na[91]. Ev yek ji bilî biryara Encûmena Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî yan jî pejirandina destûra Romayê ji alîyê Sûrîyayê ve pêk nayê. Ev tê wê wateyê ku bijardeya Dadgeha Tawanan a Navneteweyî bêyî biryareke Encûmena Ewlekarîyê, rê li ber îhtîmala ku kesên ku berpirsîyarîya herî mezin di binpêkirinên giran de ne ku ji ceza û darizandinê birevin veke (wek serkirdeyên rêxistina ku hemwelatîyên welatên Sûrî, Îraqî, dewletên Kendava Erebî, û welatên din ên Asyayê ku ne alîgirê Peymana Romayê ne). Ev jî dibe sedem ku bawerîya gelên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi dadwerîya navneteweyî nemîne yan jî li kêmê bikeve. Ji ber ku dadgeh tenê dê hemwelatîyên bîyanî yên ku bi DAIŞê re têkildar in, û yên ku hemwelatîbûna dewletek endama Yasaya Romayê ne, lêkolîn bike an dadgeh bike. Di vê rewşê de, pêwîst e gelên bakur û rojhilatê Sûrîyayê li ser avakirina mekanîzmayên din ên dadwerîyê yên xwecihî ji bo temamkirina rêkarên Dadgeha Tawanan a Navdewletî, û dadgehkirina endamên DAIŞê yên ku hemwelatîyên welatên ne alîgirê yasaya Romayê ne, wek sûrî, iraqî û neteweyên din ên Asyayî, ew jî li pêşberî desteyeke dadwerî ya herêmî û li gorî yasayên Rêveberîya Xweser a herêma bakur û rojhilatê Sûrîyayê.

## Şaxê Duyem: Dadgehên xwecihî yên ku tê pêşbînkirin ji bo darizandina DAIŞ`ê bên damezirandin

Li hemberî ranebûna civaka navdewletî bi berpirsîyartîyên xwe, û ji ber xeterîya dosyaya endamên DAIŞ`ê yên girtî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, ku heta niha ji dema rûxîna Dewleta Îslamî li Îraq û Sûrîyayê di Adara 2019`an de nehatine darizandin, her wiha li gorî qanûna navdewletî ya mafên mirov û qanûna mirovî ya navdewletî Rêveberîya

91 مارك لاتايمر، شابنام مجتهدي وليانا تاكر، "خطوة نحو العدالة...خيارات المساءلة الحالية للجرائم المرتكبة في سوريا في إطار القانون الدولي"، مرجع سابق.

Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê biryara dadgehkirina sûcdarên DAIŞ`ê li gorî derfet û qanûnên xwe stand.

Bê guman, biryareke bi vî awayî sedemên xwe hene **(Yek)**, lê prosesa dadgehkirinê ya xwecihî jî gelek zehmetî û astengîyên xwe hene, nemaz ji alîyê zanistî ve **(Du).**

**Yek: Sedem û mehne**

Dixuye ku gelek sedem û mehneyên vê biryara Rêveberîya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê yên taybet bi dadgehkirina endamên DAIŞ`ê hene, hin ji wan qanûnî û hiqûqî ne, û hin jî ewlekarî ne.

**Yekem: Dadmendîya ji qurbanîyan re û aramîya bo herêmê:**

Xuya ye armance sereke ya dadgehkirina endamên DAIŞê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyayê peydakirina dadmendîyê ji bo qurbanîyan, malbatên wan û civaka mexdûran e, ew jî bi rêya hesabpirsîna kesên ku tawanên herî hovane li dijî gelên herêmê pêk anîne. Di daxuyanîya fermî ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê de hat gotin ku "Darizandin dê bi awayekî eşkere, adil û zelal bin, bi awayekî ku mafên dozger, qurbanî û malbatên wan bên parastin[92]." Rêvebirîyê dîyar kir ku "biryara wê ji ber bêberpirsyarîya civaka navneteweyî ji bangên wê yên ji welatên ku welatîyên xwe ji rêxistinê werbirgirin re, ji bo bidestxistina mafan, pêkanîna edaletê ji bo mexdûran û pêkanîna dadmendîya civakî hat[93]."

Li milekî din, dadgehkirina endamên DAIŞ`ê dikare bi bicihanîna aramî û ewlehîya sîyasî li herêmê bibe alîkar. Çimkî bi meseleya dadgehkirin û hisabpirsîna li ser sûcan şansên vegera tundirewî û radîkalîyê kêm dibin, û aştî û aramî li herêmên ku berê li jêr kontrola rêxistina DAIŞ`ê bûn, û li wan herêman sûc û binpêkirinên herî hovane ji alîyê wê rêxistinê ve hatin encam dan bi cih bên.

Ya rast ew e ku tirsa vegera terorê bo herêmê û vejîna "xîlafeta" rêxistinê heye. Karbidestên dij-terorê yên rojavayî bawer dikin, wekî ku New York Times di Gulana 2020-an de ragihand, ku çekdarên bîyanî her ku dema girtina wan dirêj dibe, "ew ew qas radîkal dibin û îhtîmala ku ew bi

[92] ضياء عودة،" محاكمات مقاتلي داعش في شرق سوريا...اعلان يطلق سؤالين"، متوفر على موقع قناة الحرة، https://www.alhurra.com/syria/2023/06/13/

[93] Heman jêdera borî

girseyî birevin zêdetir dibe[94]." Weke ku lêkolîna *Human Rights Watch* li çend welatan nîşan daye, têkçûna prosesa hisabpirsîna berpirsên tawanên herî hovane yên navneteweyî dibe sedema binpêkirinên pêşerojê[95]. Di vê çarçoveyê de, bûyera zindana “Pîşesazî” ya Xiwêranê li bajarê Hesekê di sala 2022an de nimûneyeke baş e ji bo wê yekê[96], bi taybetî ku Hêzên Sûrîya Demokratîk (HSD) ji bilî navendên girtina çekdarên DAIŞê, zêdetir ji 10 kampên ku bi deh hezaran malbatên ku ji ber şer û pevçûnan derbider bûne, di nav wan de jinên ne-Sûrî yên çekdarên DAIŞê hene, û zarokên wan li kampên Hol û Roj li parêzgeha Hesekê ne[97].

## Du: Rêgirtina li ber bêcezahiştinê

Têkoşîna li dijî çanda bêcezahiştinê û bipêşxistina serwerîya qanûnê dikare bibe alîkar ku sazîyên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê li dijî kiryarên terorîstî bisekinin û piştgirîyê bidin xebatên têkoşîna li dijî terorê[98].

Têgiha "bêcezahiştinê" tê wateya rewşên ku ti rêkarên bibandor ji bo cezakirina sûcdarên binpêkirin û sûcên giran[99] tune ne. Di hiqûqa navdewletî de, prensîba bêcezakirinê bi jênerevîna cezayê ve girêdayî ye, ji ber ku ew armanc dike ku dadmendîyê bi têrkirina hesta giştî ya kes û civakê pêk bîne[100]. Bêcezabûn bi piranî ji nebûna mekanîzmayên dadwerî

---

94 هيومن رايتش ووتش، " سوريا: العدالة الجنائية على الجرائم الجسيمة في القانون الدولي"، متوفر على العنوان التالي: https://www.hrw.org/ar/news/2013/12/17/252144

95 Heman jêdera borî

96 موقع قناة العربية، هروب دواعش من سجن غويران وحظر تجوال في الحسكة، https://www.alarabîya.net/arab-and-world/syria/2023/08/27/

97 Navenda Firatê ya lêkolînan, " Zarokên DAIŞ`ê li kamp û navendên rehabîlîtasyonê.. (Metirsî, kêşe, û rêyên çareserîyê)": https://firatn.com/kur/?p=2461

98 Li gorî Human Rights Watch, civaka navdewletî - û Encûmena Ewlekarîyê bi taybetî - ji mêj ve pêdivî ye ku gavên bilez û berbiçav bavêje ji bo şerkirina hewaya bêcezabûnê ya ku niha li Sûrîyayê serdest e. Weke gava yekem divê Encûmena Ewlekarîyê rewşa Sûrîyayê radestî Dadgeha Tawanan a Navdewletî bike. Pêdivî ye ku bêtir welat beşdarî bangewazîyê bibin û ji endamên nerazî yên Encûmena Ewlekarîyê re zelal bikin ku hewcedarîya çareserkirina pirsgirêka berpirsîyarîyê heye. Human Rights Watch herwiha di wê bawerîyê de ye ku Dadgeha Tawanan a Navdewletî foruma herî bi bandor e ji bo lêkolînkirina wan kesên ku herî zêde berpirsyarîya binpêkirinên li Sûrîyayê li ser wan heye, û ku ev dadgeh dikare roleke navendî bilîze di nebûna perspektîfan de ji bo çalakîyeke bibandor li ser vê rêyê ji alîyê rayedarên niştimanî yên Sûrîyayê ve راجع: هيومن رايتش ووتش، "سوريا: العدالة الجنائية على الجرائم الجسيمة في القانون الدولي"، مرجع سابق.

.

99 القاموس العملي للقانون الإنساني، "إفلات من العقاب"

100 بن بوعزيز آسيا، "دور العدالة الجنائية في تفعيل مبدأ عدم الإفلات من العقاب".

yên ku bikarin biryarê li ser nepabendbûna bi yasayên navdewletî bidin, yan jî ji ber nebûna îradeya sîyasî ya navdewletî yan jî tevlîhevîya rewşa sîyasî di hin dozan de[101], wek doza Sûrîyayê encam dide. Li gorî Komîteya Mafên Mirovan a li ser pêşvebirin û parastina mafên mirovan, bêcezakirin ew e ku lêpirsîn, bi qanûnî yan jî di pratîkê de, ji sûcdarên binpêkirinan bi anîna dozên tawanan, sivîlî, îdarî yan dîsîplînê, pêk neyê ji ber ku ew rastî ti lêpirsîneke wan tawanbar bike, yan bihêle ku werin girtin, dadgehkirin û birîna hukim li wan nehatine eger ew tawan were îsbatkirin, da ku wan bi cezayên guncaw hukim bikin, û tazmînatê bide qurbanîyên wan.

Lê bîcezahiştinê di qanûna navdewletî ya mafên mirov de tê wateya ne-pêşkêşkirina binpêkerên mafên mirov bo adaletê, û ev yek bixwe wendakirina mafên mexdûr û qurbanan e, nemaze li welatên ku hikûmeta wan sûcên komî der heqê sivîlan de kirine[102].

Îcarê, ji ber ku civaka navdewletî derbarê tawanên endamên DAIŞê li bakur û rojhilatê Sûrîyayê de ti gav neavêtîye, û Encûmena Ewlekarîyê berpirsyarîya xwe di parastina aştî û ewlehîya navdewletî[103] de negirtîye ser milê xwe, her wekî radestnekirina van tawanan bo dadgeha tawanan a navdewletî, divabû di destpêkê de ji bo cezakirina sûcdarên sûcên navneteweyî yên ku bandorê li wijdana mirovan dike, û ji bo pêşîgirtina ji cezakirinê[104], tedbîrên herêmî bihatane girtin û mekanîzmayên dadwerî yên herêmî ji bo lîstina vê rolê bihata avakirin.

### Sê: Karîna ji bo serwerîyê û piştgirîya xebatên li dijî terorê

Biryara[105] dadgehkirina tawankarên DAIŞê li pêş dadgeheke herêmî, bi hewlên xwe û bi şêweyekî ku li gorî pîvanên dadwerîya navdewletî be, bi

---

101 دعاس أسية،" مبدأ عدم الإفلات من العقاب في القانون الدولي"، مجلة البصائر للدراسات القانونية والاقتصادية، المجلد 2، العدد 3، أذار 2021.

102 علاق نجيمة،" إعاقة دور المحكمة الجنائية في مكافحة الإفلات من العقاب "، مرجع سابق.

103 Di derbarê damezirandina dadgeheke taybet a navdewletî jib o hisabpirsîna wan sûcdarên xeternak ên li ser asta cîhanê, civaka navdewletî xwe nelivand û ti helwesteke wê ya zelal di derbarê vê mijarê de tune bû. Rêveberîya Xweser gelek caran bang li dewletên bîyanî kir da çareyekê ji vê dosyayê re bibînin, wan dewletan li ser giringîya vegerandina girtîyên xwedî nasnameyên bîyanî tekez kir, lê ji bilî hin vegerandinên takekesî, ti bersiv ji wan bangan re li ser asteke giştî û komî nebû. Li rûpelên 2 û pê de ji vê lêkolînên vegere.

104 Pergala bingehîn a dadgeha Tawanan a navdewletî di bendên 4 û 5 ji dîbaceya xwe de li ser armanca xwe ya bingehîn a pêşîlêgirtina li bêcezahiştinê tekez kir.
انظر: حمدي حنان، شملان عبد العزيز،" تأثير حق النقض على دور المحكمة الجنائية في الحد من الإفلات من العقاب"، مجلة الحقوق والعلوم السياسية، المجلد 11، العدد 1، 2024، إبراهيم السيد أحمد رمضان،" آليات منع الإفلات من العقاب على الجرائم الدولية في نطاق المحكمة الجنائية الدولية"، المجلة المصرية للقانون الدولي، العدد الثاني والسبعون، 2016.

105 Gaveke bi vî rengî gelek xeterî û astengîyên xwe hene. Li rûpela 25 vegere.

kêmanî di warê teorî de, asta pêşketina sazîyên dadwerîyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê nîşan dide. Her wiha şîyana wan a pêkanîna darizandinên dadperwer û serbixwe ji bo dozên tawanan, ku ji alîyên Yasayî û dadwerî ve wek herî aloz û dijwar têne hesibandin.

Ji alîyekî din ve, nîşandana pabendîbûna Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi têkoşîna li dijî terorê, pêkanîna edaletê ji bo qurbanîyan û berpirsyarîya berpirsên terorîstan, dibe ku rewşa Rêveberîya Xweser û têkilîyên wê yên navdewletî baştir bike. Hemû welatên cîhana azad ji alîyê exlaqî û qanûnî ve ji bo têkoşîna li dijî terorîzma navneteweyî ya der-sînor, pêkanîna dadmendîyê ji bo qurbanîyan, û berpirsyarîya sûcdarên tawanên şer, tawanên li dijî mirovahîyê, û binpêkirinên giran ên qanûnên navneteweyî yên mafên mirovan berpirs û elaqedar in.

Her wiha dadgehkirina endamên DAIŞê dibe derfetek ji bo bidestxistina zanyarîyên giranbuha derbarê DAIŞê, torên wê yên navçeyî û cîhanî, planên wê yên paşerojê, û çalakîya şaneyên wê yên veşartî li herêmê, ji dema têkçûna wê leşkerî ya ku di sala 2019an de xwar, bi hewldanên hevbeş yên Hêzên Sûrîyayêya Demokratîk QSD û hêzên hevpeymanîya navdewletî ya bi serkêşîya Amerîkayê. Îcarêm bikaranîna van agahîyan ji bo piştgirîkirina hewldanên ji bo têkoşîna li dijî terora DAIŞ û pêşîgirtina li êrîşên pêşerojê li herêmê yan jî li welatên din.

### Çar: Rehabîlîtasyon û tevlîbûna li nav civakê

Alîyekî ji darizandinan dikare proseya rehabîlîtasyonê jî di nava xwe de bigire, ew jî bi piştgirîya rêxistinên xwecihî û navdewletî yên pêwendîdar, nemaze ji bo wan kesên ku bi awayekî yekeser destê wan di pêkanîna binpêkirinan de tune ye yan jî hatine bêsûckirin[106].

### Pênc: Girtina heta demeke dirêj bêyî werin dadgehkirin

Hiqûqa mafên mirovan girtina heta demek nedîyar, ku wekî binpêkirina qanûnên mafên mirovan ên navneteweyî tê hesibandin, red dike. Lewra, ev girtina heta demeke dirêj barê Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê di warê ewlehî û mafên mirovan de; dabînkirina lênihêrîna tenduristî û pizîşkî, xwarin û vexwarin, dabînkirina têkilî bi malbatên wan

---

106 ياسمين سووكا، "النظر على الماضي والعدالة الانتقالية: بناء السلام من خلال كشف المسؤوليات"، المجلة الدولية للصليب الأحمر، المجلد 88-العدد 862-حزيران 2006.

re, û şert û mercên guncav ên girtinê giran dike, ew jî di ber jinavbirina binpêkirina yasaya mirovî ya navneteweyî û yasaya navneteweyî ya mafên mirov[107].

Ji ber vê yekê Letta Tayler, pispora dij-terorê li *Human Rights Watch*, bang li civaka navdewletî kir ku piştgirîyê bide darizandinên li bakurê rojhilatê Sûrîyayê, di nav wan de çackanîyên pêwîst, an jî bide dadgehan li welatên xwecihî yên girtîyan an li welatek sêyemîn[108]. Tayler got: "Tiştekî ji bilî wilo, dê ne tenê binpêkirina mafên van girtîyan be ji bo dadgehkirineke dadperwer, lê ew dê bibe sîlek li rûyê qurbanîyên DAIŞê û malbatên wan ên ku hêjayî dîtina edaletê ji bo tawanên DAIŞê be jî"[109].

Rast e dadgehkirina endamên DAIŞê li bakur û rojhilatê Sûrîyayê li pêşberî dadgeheke xwecihî û bi hewlên takekesî dikare bibe gaveke girîng ji bo pêkanîna dadmendîyê, jinavbirina bêcezabûnê, aramîya herêmê, jinûve-avakirina civakê û piştgirîkirina hewlên şerê li dijî terora navdewletî. Lê di heman demê de gelek zehmetî û kêşeyên mezin li pêşîya avakirina vê dadgeha ku tê xwestin bê avakirin û dadgehkirina endamên DAIŞê hene.

### Du: Astengî û zehmetî

Tevî ku Rêveberîya Xweser bi şert û mercên ewlekarîya xwecihî û herêmî yên heyî, her wiha hejmareke zêde ya endamên girtî û alozî û tevlîhevîya dozên tawanên navdewletî, biryar da ku sûcdarên DAIŞ'ê ji ber kiryarên hovane yên ku li dijî gelê Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê pêk anîn, bipirse. Dibe ku di dema niha de dadgehkirina tawanbarên DAIŞê zehmet be. Ev tê wê wateyê ku kêşe û zehmetîyên mezin hene ku dibe asteng li ser karê dadgeha xwecihî ya pispor ji bo berçavgirtina tawanên rêxistina DAIŞê ya terorsît.

### Yek: Binesazîya dadwerî

Pêwîstîya sûcên giran bi dadwerên pispor û pisporên terorê heye da ku lêkolîn û darizandinê bikin. Dozên têkildarî binpêkirinên cidî yên yasaya mirovî ya navdewletî û yasaya navdewletî ya mafên mirov, wek tawanên

[107] راجع تقرير منظمة العفو الدولية، "في أعقاب هزيمة تنظيم الدولة الإسلامية: ظلم وتعذيب وموت أثناء الاحتجاز في شمال شرق سوريا"، رقم 2024/7752/24، 2024، متوفر على العنوان التالي:
https://www.amnesty.org/ar/documents/mde24/7752/2024/ar/

[108] هيومن رايتش ووتش، "سوريا: العدالة الجنائية على الجرائم الجسيمة في القانون الدولي".

[109] Heman jêdera navborî.

şer û tawanên li dijî mirovatîyê, ku ji alîyê DAIŞê ve li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê hatine kirin, ji bo lêkolîn, îsbat, parastin û dadkirin pir bi aloz û tevlihev in. Dozên wiha gelek caran bi sedan delîl û şahidan vedihewîne. Sûcdar bi gelemperî ew kes in ku di nav rêxistinê de peywirên bilind girtine jî kesayetên bibandor in. Dozkirina kesên ku fermana sûcan dane, lê bi berpirsyarîya fermandarîyê rasterast tevlî komisyona wan nebûne û berpirsyar nînin jî pêvajoyeke dijwar e. Tesbîtkirina van kesan û îsbatkirina têkilîyên di navbera kiryarên li qadan û fermanên ji alîyê Rêbertîyê ve hatine dayîn, di alîyê dozgerî û darazê de pisporîyeke mezin dixwaze.

Ji alîyekî din ve, dixuye ku binesazîya dadwerîyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ne temam e yan jî hîn di pêvajoya avakirin û temamkirinê de ye û jêderên mirovî, pisporîya dadwerî û parêzerên şareza yên pispor di dozên tawanên aloz de, her wekî  tawanên navdewletî yên herî giran, di serî de terora DAIŞê ya ku sînor û deman derbas dike, kêm in. Ev yeka han dibe ku bandorê li dabînkirina darizandinên adil û bidestxistina edaletê bike.

**Du: Zehmetîyên ewlekarî**

Rewşa ewlekarî ya li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ne aram e, û birêkxistina dadgehkirina dadwerî û bi ewle zehmet e. Ji alîyekê ve hê jî gelek herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ji alîyê şaneyên veşartî yên DAIŞ'ê ve rastî gelek gefên ewlehîyê tên. Ev şane dikarin ji bo dadgeh, dadwer, şahid û parêzeran gefeke ewlekarî ya girîng bin, û ji bo dabînkirina jîngehek ewledar ji bo dadgehan bibe astengîyeke mezin. Li herêmê hîn dem bi dem ji alîyê şaneyên rêxistinê ve çalakîyên terorê tên kirin û pêkan e ew li dijî dadger, parêzerên dozger, şahidên mexdûr û heta malbatên wan[110] çalakîyên tolhildan û tundîyê pêk bînin. Lewra ev kesên han hewceyê parastinek taybet in, çi di dema lêpirsînê de, û çi jî di dema darizandinê de.

